

Hişmendiya Xecê

Xec bi çûkanî li şûn dê dimîne, Keçek çeleng û bîrewere. Rojekê bav ji çolê vedigere, bi rê de, pêrgî rêweyekî dibe. Rêwî dibêje : Apo, rê dûre, ka ez hinekî te hilgirim û tu hinekî tu min hilgire, ta rê li me nêzîk bibe.

Bavê xecê bi hers dibêje: Ma ez kanim te higirim?.

Piştî demekê rastî zadekê şîn tîn, rêwî dibêje : Apo, xwediyê vî zadî xwariye an na?.Bavê Xecê di xwe de dikele û dibêje: Ma te nediye ku ev zad şin e?.

Li ber dergehê gund rêwî dibêje: Apo , mala Xweda li ku ye?. Bavê Xecê her dere bi hers dibe , dibêje: Ma ez çi zanin mala Xweda li ku ye?.

Gava bavê Xecê digihe mal , Xec dinihêre ku bav xemgîne. Çi bi sere te hatiye bavo?. Bav çîroka xwe û rêwî ji Xecê re dibêje.

Xec dibêje : Bavo , mebesta rêwî ev e: Gava gotiye ku ez te hilgirim û tu min hilgire, yanê ez bipeyivim û hinekî bipeyive. Ya din ku xwediyê zad dindar be, yanê zadê xwe Pêş ve xwariye, û siyem , mala Xweda mizgeft e.

Wî hingê bavê Xecê li xwe poşmam dibe.

Xewc bi lez diwazdeh hêk kelandin û heft nan xistin çiqinê û gote bavê xwe . Bavo here vê çiqinê bide rêwî. Bi rê de, bav Nanekî û hêkekê dixwe. Li ba rêwî lêborîna xwe jê dixweze. Gva rêwî çiqinê vedike, dibîne yazdeh hêk û şeş nan in.

Rêwî dipirse: Abo sala we yazdeh heyv û hefteya we şeş roj in?.

Gava bavê Xecê vedigere Mal, Xec dipirse: Bavo rêwî çi ji te re got?. Bav dîsa Çîroka xwe ji Xecê re dibêje. Xec dibêje bavo te bi rê de nanek û hêkek xwarî ye? . Bavo , here rêwî bîne mal.

Piştî rêwî demekê dibe mîvanê Xecê . bi hev re dizewicin .

Ew gihîştin mirazê xwe wîn ji digihin mirazên xwe

Dumahîk: Gotina Encûmena...

Li ber roniya biryarên kongir komîtêyên hevdîtinan li derve û hundir hatin çêkirin û gelek hevdîtin bi hêzin Kurdî , hêzên niştimanî yên Sûrî , dewletên Ereb û navdewletî re hatin girêdan .

Ji wan hevdîtinan , hevdîtinên , ku bi encûmana gel ya rojavayî Kurdistanê re çêbûne , di encama wan hevdîtinan de derxistina belgeya lihevkerinê bû . Ewê ku naveroka wê lihevkerina rêzanî û çalakiyên li ser erdê ye . Lê mexabin ta neha baş cî negirtiye û emê her bi şopînin ta ku cî bigre . Ji ber ku em bawerin , ku bicîkirina naveroka wê di xizmeta bercewandiya gelê me û şoreşê Sûriyê de ye . Lê ev civîna dawiyê di navbera herdu encûmanan de , li Erbîlê hatiye girêdan û tekûzkirina , geşkirina bi karanîna belgeya lihevkerinê hêviyan bilind di ke .

Li dawiyê em bi nave E.N.K S , beşdarbûna we spas dikin . Em ji gelê xwe dixwazin , ku li dor encûmana xwe bi civin .

Heleb 14/6/2012an
ENCÛMENÊ NEŞTUMANÎ KURD
LI SÛRIYÊ - HELEB -

